WÊNESAZÎ

NAVÎN 2

2019/2020

AMADEKAR

Ev pirtûk ji aliyê Komîteya WÊNESAZIYÊ ve hatiye amadekirin.

LÊVEGER

- **Komîteya Şopandinê**
- **Komîteya Fotoşopê**
- **Komîteya Redekteyê**

Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.

NAVEROK

BEŞA YEKEM: RENG Û WÊNESAZÎ 7

XÊZKIRINA GEWDEYÊ MIROV (1)..............................8

XÊZKIRINA GEWDEYÊ MIROV (2)............................12

CIL Û BERGÊN GELÊRÎ 17

TEKNÎKÊN RENGÎNKIRINÊ 20

HÊMANÊN DÎZAYINKIRINA HUNERÎ (1)................25

HÊMANÊN DÎZAIYNKIRINA HUNERÎ (2)................30

NEQŞEYA LAWIRÎ...34

XUYANGA AVAHIYÊ 37

DÎZAYINKIRINA RÊKLAMEKÊ.................................42

DARISTAN...46

HUNERA DÎKORÊ 49

SKETCH (SIKÊTŞ)...54

BEŞA DUYEM: KARÊ DESTAN.......................... 57

TEŞEYÊN JI HEVÎRÊ SÎRAMÎKÊ................................58

SELIKEK JI TA...61

MÛMDANK..66

TEŞEYÊN JI KILORA (CD)..70

KARÊN JI GÛZIKA ÇAMÊ 73

BEŞA SÊYEM: ÇANDA HUNERÎ........................ 75

HUNER DI ŞARISTANIYÊN MOZOPOTAMIYAYÊ DE (1)..76

HUNER DI ŞARISTANIYÊN MOZOPOTAMIYAYÊ DE (2)..78

HUNERA ŞARISTANIYA MISRÊ YA KEVN 81

BEŞA YEKEM: RENG Û WÊNESAZÎ

1- XÊZKIRINA GEWDEYÊ MIROV (1)

2- XÊZKIRINA GEWDEYÊ MIROV (2)

3- CIL Û BERGÊN GELÊRÎ

4- TEKNÎKÊN RENGÎNKIRINÊ

5- HÊMANÊN DÎZAYINKIRINA HUNERÎ (1)

6- HÊMANÊN DÎZAYINKIRINA HUNERÎ (2)

7- NEQŞEYA LAWIRÎ

8- XUYANGA AVAHIYÊ

9- DÎZAYIKIRINA RÊKLAMEKÊ

10- DARISTAN

11- HUNERA DÎKORÊ

12- SKETCH (SIKÊTŞ)

WANE 1

XÊZKIRINA GEWDEYÊ MIROV (1)

Armanca hunerî:

Geşedana karîna xwendekar ji çawaniya nîgarkirina tevgerên laşê mirov li gorî pîvanên rast.

Xêzkirina gewdeyê mirov li gel hinekan, ji zehmettirîn mijarên nîgarkêşiyê ye, ku rêbaz û teknîkên wî cuda ne, lê di vê waneyê de em rêbazekî pir hêsan saz bikin; ku bi alîkariya teşeyên gometrîk, gewdeyê mirov xêz bikin.



Di xêzkirina gewdeyê mirov de, van xalan di ber çavan re derbas bike:

1. Di dema xêzkirina gewdeyê mêr de, divê em zanibin ku bejinziraviya gewdeyê mêr ji ya jinê kêmtir e, ku bi teşeyekî çargoşeyî, xwediyê masûlke û milên wî pan in. Her wiha divê em ji bîr nekin ku gewdeyê mêr berevajî gewdeyê jinê ye, ku bi temamî rast e bêyî tu xwarbûnê.
2. Di gewdeyê jinê de, hin pêçdarî ji gewdeyê mêr cuda ne, mîna her du mil, sîng û kemaxa wê. Di xêzkirina tevgera jinê de, divê em van pêçdaran di ber çavan re derbas bikin.
3. Di dema xêzkirina cil û bergan de, divê em cudahiyê bixin navbera kesayeta jin û mêr de.



Balê bikşîne ser vê teşeya li aliyê rastê, ku çawa milên mêr pan in û pêç di gewdeyê wî de kêm in, bervajî wê yekê, gewdeyê jinê têr pêç e, her wiha cudahiya xêzkirina cil û bergên wan baş zelal e.

Em ji bîr nekin ku teşeyê cil û bergan li gor qebareya mirov, ango lawazbûn, qelewbûn, kinbûn û dirêjbûna wî, cuda dibe.



Em dikarin di rêya xêzan re rewşa gewdeyê mirov û tevgera wî bi balkişandina li ser gihikên sereke re, destnîşan bikin.



Piştî bidawîbûna teşeyê destpêkî, em ê hûrgiliyên gewde xêz bikin, mîna masûlkeyên dest, sîng û gedeyê.



RAHÊNAN

Hewl bide ku tu gewdeyê kesayetekê (jin an mêr) li gor rêbazê ku em fêr bûne, xêz bikî, lê hûrgiliyên cudahiya her du zayendan ji bîr neke.

WANE 2

XÊZKIRINA GEWDEYÊ MIROV (2)

Di waneya bûrî de, em fêrî cudahiyên gewdeyên her du zayenda bûn. Di vê waneyê de, em fêrî xêzkirina gewde li gor pîvanan bibin.

1. Pîvana gewdeyê mêr, heşt serî ne, ku di serdema ronesansê de ev pîvan wek pîvana ji gewdeyê mêr re, hat danîn.



2. Hestiyê qorikê girovereke rast e, di navbera nîşana 3-4 de ye. Gihikên kemax pala xwe didin nîşana 4 ku panahiya wê nêzî 1,5 ta 2 seriyan e.



3. Gihikên kabokê pala xwe didin nîşana 6`em.



4. Piş û rikeha sîngê bi teşeyekî hêkî ji nîvê xêza di navbera nîşana 1 û 2 'em de ber bi nîşana 3'em ve, dest pê dike. Lê ya baş ew e ku ji beşê binî ve were qutkirin, ji ber ku bi vê yekê bêhtir nêzî teşeyê rastî yê rikeha singê dibe. (wek çawa di teşe de diyar dibe)
5. Xêza milan di navbera nîşana 1 û 2`em de, tê xêzkirin ku ev xêz piçekî ber bi jêr de ye, ango xêzeke xwar e.



6. Her du girdik li ser nîşana 4`em tên xêzkirin, ku piçekî ji gihikên kemaxan jêrtir e û dawiya tiliyan dighêjin nîvê ranan a ku dikeve beramberî nîşana 5`em. Her wiha em ê li beramberî nîşana 3`em ji her du aliyan ve, du teşeyên hêkî xêz bikin, ta ku em her du enîşkan destnîşan bikin.



7. Em ê teşe bi gewde bikin, ta ku paşê em dest bi xêzkirina hûrgilî, cil û bergên wî bikin.



8. Em ê dest bi xêzkirina hûrgilî û mirûzên rû bikin. Lê em ji bîr nekin ku ev teşeyê me xêzkirî, gewdeyê mêr e, lewma divê em pîvan û cil û bergên wî, di ber çavan re derbas bikin.

Di rêya vî rêbazî de û bi xweperwerdekirinê re, êdî tu dê karibî teşeyê rast ê gewdeyê mirov xêz bikî.

RAHÊNAN

Li gorî gavên ku me naskirin, hewl bide ku tu gewdeyê mirovekî ku tu dixwazî bi pîvanên guncaw û rast xêz bikî.

WANE 3

CIL Û BERGÊN GELÊRÎ

Armanca hunerî:

Geşedana nasîna xwendekar ji nasîna cil û bergên gelêrî re.

Cil û bergên folklorî(gelêrî):

Bêguman her gelek cil û bergên wan ên cuda hene û wan ji gelên din ciyawaz dike, ku ev cil û berg parçeyek ji folklor û çanda wan e û rêyek ji rêyên avabûna şaristaniya wan e.

Cil û bergên folklorî yên kurdan

Cil û bergên folklorî yên ereban

Cil û bergên folklorî yên suryanan

Her wiha bandora xwezayê li cudahiya teşeyê cil û bergên her gelekî heye.

Cil û berg bi terz, neqşekirin û bikaranîna rengan, ji hev cuda dibin.

RAHÊNAN

Hewl bide ku tu sûdê ji wêneyên di vê waneya derbasbûyî de, bigirî. Paşê cil û bergine folklorî ku te ji wan hez kiriye, nîgar bike û bi rengên guncaw rengîn bike.

WANE 4

TEKNÎKÊN RENGÎNKIRINÊ

Armanca hunerî:

Geşedana karîna xwendekar ji nasîna rêbazên nîgarkirin û rengînkirinê yên cuda re.

Rengînkirin:

Rêbazê têkişandina rengekî yan bêhtir di rûberên ji hev cuda yan jî di teşeyekî de, bi teknîkên cuda.

Teknîkên rengînkirinê:

Ew şopa ku rengên bikarhatî û rêbazê hunermend li dû xwe dihêle, ku li gor cure û tîrbûna rengan ew şop cuda dibe. Ji vê şopê: xalkirin, xêzên siyê, zelalkirin û hwd ...

1. Teknîka xalkirinê:

Ew nîgarkirina bi xalên biçûk û pir ku li ser hêmanê xêzkirî tên danîn û sî û ronahiya wî hêmanî di ber çavan re tên derbaskirin.

Ev rêbaz ji aliyê Hunermend poul victor jules signac (Pol siniyak) û Georges pierre Seurat (Corc Sewra) ve, hatiye bikaranîn.

Tabloya Hunermend poul victor jules signac e



Tabloya Hunermend Georges pierre Seurat e.

Georges pierre Seurat (Corc Sewra):

Wênekêş û nîgarkêşekî firansiz e, di navbera salên **(1859-1891) Z** de jiyaye. Yek ji damezrînerên dibistana rewiştî ya nû ye. Ev nîgarkêş bi rêbazê xwe yê xalkirinê tê naskirin, ji tabloyên wî, tabloya bi navê "Roja yekşemê piştî nîvroyê li girava Lagrand Gat" ê ye.

poul victor jules signac (Pol Siniyak):

Nîgarkêşekî firansiz e, di navbera salên **(1835-1863) Z** de jiyaye. Bi Georges pierre Seurat re kar kiriye, bi nîgarkirina dîmenên xwezayî û bi rêbazê xalkirinê di piraniya tabloyên xwe de, tê naskirin.

2.Teknîka xêzên siyê:

Ew tevgera bi têkişandina firçeyê bi xêzên rast û pêldayî, an jî bi xêzên ji hev dûr bi aliyên cuda ve, pêk tê.



Tabloya hunermend Vincent willem van gogh (Van Gûx)

3.Zelalbûn: Ango zelaliya rengên bi kar hatine bi pileyên cuda.



Hin teknîk aramî, balkişandin, şarezayî û hûrbîniyê nîşan didin, wek tabloyên Leonardo Davinçi (Lîyonardo Davinşî).

Hin tekenîkên din hene ku di rêya destdan û xêzên wêrek û dijwar re, derûniya hunermend diyar dike. Weke tabloyên Vincent willem van gogh.

Teknîka rengînkirinê, alîkariya diyarkirina riyaksonên ku bi hunermend re derbas dibin, dike. Ku ji hunermendekî ta hunermendekî din, cuda ye.

RAHÊNAN

1. Hewl bide ku tu dîmenkî xwezayî bi teknîka xalkirinê, nîgar bikî û bi rengên guncaw rengîn bikî, her wiha têkiliyên rengan di ber çavan re derbas bikî.
2. Hewl bide ku tu tabloyekê bi teknîka xêzên siyê, nîgar bikî û bi rengên guncaw, rengîn bikî.

Leonardo Davinçi (Lîyonardo Davinşî): Ew wênesazekî Îtalî ye di sala 1452'yan de ji dayîk bûye û di sala 1519'an de jiyana xwe ji dest daye.

Ew ji navdartirîn wênesazên ku di dîrokê de hatine pejirandin.

Ne tenê wênesaz bû, di heman demê de zana, endezyar, peykersaz û avahîsaz bû. Ji tabloyên wî yên herî navdar: Monalîza, şîva dawî, Keça latan.

Tabloya Monalîza

Gelek tabloyên Leonardo Davinçi hene. Tevî ku gelek dem di ser wan re derbas bûye jî, wekî tabloyên zindî tên naskirin.

WANE 5

HÊMANÊN DÎZAYINKIRINA HUNERÎ (1)

Armanca hunerî:

Geşedana nasîna xwendekar ji hêmanên dîzayinkirinê re.

Dîzayinkirin:

Daneheva di navbera gelek hêmanan de, ji bo çêkirina karekî hunerî.

Hêmanên dîzayinkirinê:

Xal, xêz, rûber, teşe, cih, pelandin û reng.

1. Xal: Hêsantirîn û biçûktirîn hêmanên şêwekariyê ye. Destpêka çêbûna xêz û rûberan bi cure, reng, rêxistin û dûrahiya wan a cuda ye. Piraniya kesan wê bi teşeyê girover dibînin.



2. Xêz: Ew şopa ku livandina xalekê ber bi rêgeheke destnîşankirî ve, li dû xwe dihêle. Cih û berê xêzê heye

ku roleke sereke di pêkanîna karê hunerî de dike. Di xwezayê de, xêz bi gelek awayan peyda dibe.

Dibe ku xêz: asoyî, xwar, pêldayî, şkestî û hwd be, ku bi alîkariya van xêzan, em dikarin tabloyan saz bikin.



Em bi hev re li vê tabloyê baş binêrin û tê de bibînin çawa xêz bi hemû cureyên xwe tê de peyda bûne.

3. **Rûber:** Diyarkirina tevgera xêzikê di aliyekî destnîşankirî de ye . Rûber di karê hunerî de, gelek aliyan di nava xwe de digire:

- **Jimar:** Jimarên rûberên ku dikevin nav pêkhateya dîzayinkirinê.
- **Qebare:** Hevrûkirina qebareya hêmanan (mezin, navberî û biçûk).

Di tabloya hunermendê Emrîkî John bramblitt (Jon Biramlît) de, afrandina komkirina di navbera hêmanên dîzaiynkirinê de, tê dîtin (jimar –qebare).

4. Teşe: Ew rûbera dorpêçkirî ya di navbera hin xêzên girtî de ye. Dibe ku ev rûber, teşeyên geometrîkî an jî xweber be.

Tabloya hunermend Şewqî Zexlûl

Şewqî Zexlûl: Hunermendekî Misrî ye **(1947-1988) Z** navdartirîn nîgarkêşên ereba ye ku bi tabloyên xwe yên xweşik, navdar bû.

5. Cih: Cihê rûber ji çarçoveya karê hunerî re.

Em di vê tabloyê de dibînin ku çawa hunermend John bramblitt bi rêbazekî hunerî, hevsengî di navbera teşe, cih û qebareyê de kiriye.

RAHÊNAN

1. Dîmeneke xwezayî bi rûberên cuda ji hêmanaên dîzyinkirinê nîgar bike, bi rengên avî yan ên zeytî reng bike û têkiliyên renegan di ber çavan re, derbas bike.

WANE 6

HÊMANÊN DÎZAIYNKIRINA HUNERÎ (2)

Hêmanên dîzayinkirinê ji giringtirîn tiştên ku divê di destpêkirina nîgarkirina tabloyeke hunerî de, di ber çavan re bên derbaskirin. Hêman bi xal, xêz û rûberê dest pê dike û piştre pelandin û reng ku xweşikbûnekê dide tabloyê.

6. Pelandin:

Ew teşeyê derveyî ji rûyê heyberkî ye. Ji van rûyan jî rûyên şayîk û zivir.

Pelandin, dabeşî du beşan dibe, ew jî ev in:

A-Pelandinên xwezayî:

Ew tiştên ku di rêya destpelandin û nêrîna bi çavan de, tê xuyanêkirin.

B-Pelandinên xapînok:

Ew pelandinên şayîk in, lê zivir tên xuyanêkirin.



Di vê tabloya Van Gox de, çawaniya belîkirina pelandinê di nîgara wî de, diyar e.

7. Reng: Hestê nerînî yê ku çav di rêya ronahiya vajî ya ji gewde re, pê hest dike. Çi ji heybera rengîn be yan jî ji ronhiya rengîn be.

Taybetmendiyên reng:

1. **Jêdera reng:**
   Navlêkirina reng e, ku em dikarin rengekî ji yê din cuda bikin.
2. **Nirxê reng:**
   Rêjeya piledariya reng, ji spî ta reş.
3. **Tîrbûna reng:**
   Rêjeya zelalbûn û tîrbûna reng e, ku reng di lûtkeya xwe de ye , bêyî zêdekirina tu rengên din .

Reng dabeşî çar grûpan dibin. Ew jî ev in:

1. **Rengên sereke:**
   Sor, zer û şîn e.
2. **Rengên dariştî:**
   Kesk, binefşî û pirteqalî ye.
3. **Rengên navberî:**
   Encama tevlihevxistina rengekî sereke û yekî dariştî, ku şeş reng tên bidestxistin. Ew jî ev in: Zerê ber bi kesk ve, şînê ber bi kesk ve, binefşiyê ber bi şîn ve, binefşiyê ber bi sor ve, pirteqaliyê ber bi sor ve û pirteqaliyê ber bi zer ve ne.
4. **Rengên bêalî:**
   Spî, reş û xakî ye.

Ji bo ku em tabloyeke ku hêmanên dîzayinkirinê dihewîne, nîgar bikin, gerek e em van xalan bişopînin:

1. Destnîşankirina hêmanên ku derbirîna mijara ku em dixwazin nîgar bikin.
2. Xêzkirina bi pênûsa risas bi xêzên sivik û zelal, yan bi xêzên rengan ên zelal.
3. Cihê hêmanan di rûberên tablioyê de, Di ber çavan re derbas bikin.
4. Qebareya hêmanan bi dûrbûn û nêzîkbûna wan, Di ber çavan re derbas bikin.
5. Rengînkirina bi rengê zeytî ku tabetmendiya pelandinê di tabloyê de diyar bibe.



Tabloya hunermendê Sûrî Lûeî keyalî

Lûeî keyalî: Hunermendekî sûrî ye **(1934-1978 Z)** li Îtalyayê di gelek pêşangeh û pêşbirkan de beşdar bûye û di pêşbirka Sicilia (sîsîliya) xelata yekem bi dest xistiye.

RAHÊNAN

Hewl bide ku tu dîmenekê ji demsala biharê re li gund nîgar bikî, ku tê de hêmanên dîzayinkirina hunerî derbas dibin.

WANE 7

NEQŞEYA LAWIRÎ

Armanca hunerî:

Geşedana nasîna xwendekar ji neqşeya lawirî re.

Neqşeya lawirî:

Ew neqşeya ku ji nîgarkirina hin lawiran bi teknîkeke hunerî, saz dibe.

Neqşeya lawirî di gelek cihan de hatiye bikaranîn, di avahîsazî, warên wêjeyî , destnivîsan de û hwd ...

Bikaranîna vê neqşeyê di fûseyfûsayê û nîgarên dîwarî de, pir berbelav diyar bû û bêhtirî caran neqşeya şînatiyê li çarçoveyên li derdora neqşeya lawirî dihat bikaranîn, lê zêde bi neqşeya gometrîkî re nedihat.

Em dikarin bêjin ku bikaranîna neqşeya lawirî ya herî kêm bû ji nav neqşeyên din (şînatî û gometrîkî) û bêhtir di neqişkirina dep, cam, hirî, sifir û gêçê de, dihat bikaranîn.



Em di vê wêneyê de dibînin ku her du neqşên lawirî û şînatiyê bi teknîkeke hunerî, bi hev re hatine bikaranîn.

RAHÊNAN

Hewl bide ku tu firaxekê nîgar bikî ku tu bi neqşeya lawirî li ser neqş bikî, lê di bikaranîna rengan û ahengsaziya wan de, balder be.

WANE 8

XUYANGA AVAHIYÊ

Armanca hunerî:

Geşedana karîna xwendekar ji sazkirina dîmenekî ji avahiyê re bi teknîka xuyangê.

Nîgarkirina xuyangê pala xwe dide sê xalên sereke. Ew jî ev in:

1. Xêza asoyî:



Ev xêz yekser dikeve pêşberî çavên bîner, ku li gor bilindbûn û nizmbûna çavên bîner ji erdê, bilind û nizm dibe.

2. Xala destpêkê (belavbûnê):

Her wiha bi navê xala revînê tê binavkirin, ji ber ku xêzên ku gewde destnîşan dikin, ber bi vê xalê ve ku dikeve di xêza asoyî de, diçin.

3. Xala nerînê:

Xala gihaştina xêza stûnî ya ku ji çavê bîner, diçe xêza asoyî.

Ta ku em karibin avahiyekê bi teknîka xuyangê xêz bikin, pêwîst e em van gavan bişopînin:

1. Em ê pelê dabeşî çar çariyên bi qasî hev bikin. Her wiha em ê her du xalên pevgihandina xêza navberî a asoyî bi sînor re, ku ev her du xal bi navê xala belavbûnê ya çep û rastê tê naskirin.

2. Em ê xêzine asoyî yên sivik xêz bikin û lûtkeyan nêzî xalên belavbûnê yên rast û çepê bikin.



3. Em ê hin stûnên din xêz bikin û bighînin xalên belavbûnê.



4. Em ê heman gavan li aliyê çepê jî bişopînin, wek çawa ku di vê wêneya jêr de diyar dibe.



5. Em ê xuyangeke din lê zêde bikin û xêzan tarî bikin.



6. Em ê aliyê rastê ji avahiyan sî bikin, penceryan xêz bikin, û hin xêzine asoyî li ser kolanê jî, xêz bikin.



RAHÊNAN

Piştî ku te gavên sazkirina avahiyan di rêya xuyangê de nas kir, hewl bide ku tu avahiyan ji xalên belavbûnê xêz bikî, lê aliyê sî û ronahiyê di ber çavan re, derbas bikî.

WANE 9

DÎZAYINKIRINA RÊKLAMEKÊ

Armanca hunerî:

Geşedana karîna xwendekar ji dîzayinkirina rêklamekê li gor hêmanên dîzayinkirinê.

Pêwîstiya Gelekekan ji me bi çêkirina rêklaman heye, ne tenê ji bo kar, dibe ku carinan ji hezkirina dîzayinê, mirov rêklamekê dîzayin bike.

Di vê waneyê de, em ê fêrî çawaniya dîzayinkirina rêklamekê bibin.

Rêklam: Ew teşeyeke çapkirî ye, di rêya nîgar û nivîsê de, daberîna ramanekê dike. Dibe ku ev yek di rêya kompiyûter re pêk bê ku tê de rengên zelal û xurt, tên bikaranîn.

Berî destpêkirina dîzayinkirina rêklamê, divê em van xalan di ber çavan re derbas bikin:

1. Nîvîsa li ser rêklamê.
2. Dîzayinkirina rêklamê.
3. Nirxandina rêklamê.

Em ê van xalan bi hûrbînî zelal bikin:

Nivîs: Divê peyv biçûk, kurt û balkêş bin.

Dîzayin: Divê wêne hêsan û bibandor be û bi rengên guncaw hatibe rengînkirin.

Nirxandin: Ger em nerîna hevalên xwe derbarê rêklam û dîzayinê de bixwazin, dê baştir be.



Çêkirina rêklaman ne tişetkî hêsan e, ku her xaleke me şîrove kiriye xwediya girîngiyeke pir mezin e û girêdayî serkeftina wê rêklamê ye.

Ji bo çêkirina dîzayina rêklamekê, em ê van gavan bişopînin:

1. Em ê hêmanên girêdayî mijarê bi pênûsa risas yan jî bi pênûsên rengîn û xêzên zelal û sivik, nîgar bikin.
2. Bi rengekî hevseng, komkirin û rêkûpêkkirina rêklamê.
3. Em ê piştnîgarê û hêmanan bi rengên balkêş û guncaw, reng bikin.
4. Guhdana derhêneriya hunerî û paqijiya kar.

RAHÊNAN

Hewl bide ku tu rêklameke şêwekariyê bi rûbera 10-15 cm, biafirînî, lê hêmanên dîzayinkirinê û rola wan ji bîr neke.

WANE 10

DARISTAN

Armanca hunerî:

Geşedana karîna xwendekar ji nîgarkirina komek dar û çawaniya bikaranîna rengên sar û yên germ di tabloyê de.

Daristan:

Jimareke pir mezin ji daran dihewîne û ew parçeyeke ji sîstema jîngeha me ye ku çi zirar bigihêje daristanê, dê tevliheviya hevsengiya xwezayî, çêke.

Gavên nîgarkirina daristanekê:







Ta ku em daristanekê bi awayekî baş nîgar bikin, em dikarin van gavan jî bişopînin:

1. Destnîşankirina hêmanên ku em dixwazin xêz bikin.
2. Nîgarkirina bi pênûsa risas an bi pênûsên rengîn, bi xêzên sivik.
3. Belavkirina hêmanan bi awayekî hevseng û di berçavderbaskirina dûrbûn û nêzîkbûnê.
4. Em ê rengên sar û yên germ di rengînkirina hêmanan de, bi kar bînin.
5. Guhdana bi derhênerya hunerî.

RAHÊNAN

Piştî ku te nerînek li ser çawaniya nîgarkirina daristanê stand, hewl bide ku tu dîmenekî ji daristanê re nîgar bikî, lê hevsengiya rengan ji bîr neke.

WANE 11

HUNERA DÎKORÊ

Armanca hunerî:

Geşedana karîna xwendekar ji çawaniya dîzayinkirina dîkorekî ji malê re.

Hunera dîkorê:

Hunera xemilandina derdora xwe ye ku li ser mirês, hevsengî û xweşikbûnê ava dibe. Ev yek li gel civakan ji hêmanên pêşketina hizir, çand û hunerê ye.

Dîkor hem zanist û hem jî huner tê dîtin, ku ev yek dihêle dîzaynker li bingehên zanistî û hunerî her duyan vegere, ta ku teknîk, taybetmendiyên heyberan û çawaniya bikaranîna wan baş nas bike.

Hunera nîgarkirina li ser dîwaran:

Li seranserî cîhanê, ji dîkorên herî berbelav e ku destdaneke hunerî li dîkorê malê, zêde dike. Dîkora dîwaran bi bikaranîna mûzayîk û firîsko tê naskirin.

Nîgarkirina bi teknîka firîsko li ser dîwar

Nîgarkirina bi teknîka mûzayîkê li ser dîwar

Hunera Mûzayîk:

Peyva mûzayîk li gel romanan tê wateya karê hunerî yê hevgirtî ku ji parçeyên kevirên biçûk ên ku bi awyekî hunerî û hevseng pêk tên û bi têkilekî hevseng bi dîwar ve tê vekirin.

Nîgarkirina bi teknîka mûzayîkê li ser dîwar

Hunera Firîskoyê:

Peyvek Îtalî ye tê wateya nerm. Ew yek ji cureyên hunerê ye, ê ku di rêya cebsînê re di nîgarkirina wêneyekî de ku bi awayekî hunerî li ser ezmanê hundir û dîwar tê bikaranîn.

Nîgarkirina bi teknîka firîsko li ser dîwar

Pêwîstiyên dîkorê:

1. Amadekirina cih.
2. Bikaranîna heyber û rengên guncaw.
3. Divê cih aram, rehet û ciyawaz be.

Giringî û pêwîstiya dîkorê di jiyana me de:

Guhertin û xweşikbûna dîkorê li derdora mirov, rolekê di xweşkirina derûniya mirov de dilîze, ku yek ji pêşketinên çandî, hunerî û aborî ye.



RAHÊNAN

Hewl bide ku tu dîkorekî ji ode yan jî pirtûkxaneyê re nîgar bike, lê hevsengiya rengan li ber çavan derbas bike.

WANE 12

SKETCH (SIKÊTŞ)

Armanca hunerî: Naskirina xwndekar bi çawaniya nîgarkirina sikêtşekê.

Sketch(Sikêtş): Plansaziya destpêkê ya raman û teşeya ku wênesaz dixwaze di tabloya xwe de nîgar bike , bêyî ku bala xwe bide hûrbîniyan. Bi armanca hêsankirin û diyarkirina ramanekê ye. Bidawîkirina tabloyê, ne merc e.

Sketch hunermend Leonardo Davinçi

Dibe ku nîgarkirina sikêtşeke avahiyekê, teşeya berhemeke destnîşankirî, yan jî rahênankirina dest a beriya xêzkirinê, pêşnûme çêbibe.

Ji bo nîgarkirina sikêtşekê divê hemû amûrên pêwîst amade bin û ji 5 –10 xulekan dest were rahênankirin, piştre dest bi kar bê kirin. Di dawiya kar de hêmanên wêneyê û hûrbînên wê yên ku tu dixwazî, bi tevahî xêz bike.

RAHÊNAN

Bi pênûsa risas skêtşekê ji hawirdora xwe re nîgar bike.

BEŞA DUYEM: KARÊ DESTAN

1- TEŞEYÊN JI HEVÎRÊ SÎRAMÎKÊ

2- SELIKEK JI TA

3- MÛMDANK

4- TEŞIYÊN JI KILORA CD

5- KARÊN JI GÛZIKA ÇAMÊ

WANE 1

TEŞEYÊN JI HEVÎRÊ SÎRAMÎKÊ

Armanca hunerî: Bilndkirina asta zanîna pîşesazî-kirinê li cem xwendekar, di çêkirna teşeyên cuda de ji hevîrê sîramîkê.

Hevîrê sîramîkê: Ew cureyek ji hevîrên karkiranê ye, ku bi dûz û hilûbûna xwe ji hevîrên din tê naskirin û taybetiyên wê ew e ku em dikarin wê rengîn bikin.

Ev hevîr di çêkirina gelek teşeyan de, tê bikaranîn, wek: gul, gewdeyên hunerî yên biçûk li derdora tabloyan, teşekirina sebze û fêkî ji bo xemlandina sarincê.

Amûrên pêwîst: nîşa, şîrêza spî, gelêsêrîn û reng.

Ji bo çêkirina gewdenan ji siramîkê divê em van gavan bişopînin: Em ê nîşa û şîrêza spî bi qaseyeke wekhev li nav hev bixin, heya baş hev du bigire.

Piştre em ê glêsêrîn lê zêde bikin û ji bo hevîr xwe bi dest negire pêwîst e dest bê zeytkirin, piştre em ê hevîr bixin tûrekî û nîv demjimêrê bihêlin ku ji çêkirina gewdeyên ku em dixwzin çêkin û rengîn bikin re ,hazir bibe.

RAHÊNAN

Hewl bide ku tu gewdeyan ji hevîrê sîramîkê çêkî û bi rengên guncaw, rengîn bike. Her wiha derhêneriya hunerî di ber çavan re derbas bike.

WANE 2

SELIKEK JI TA

Armanca hunerî: Geşedana karîna xwendekar di bikaranîna ta di karên hunerî de.

Em dikarin bi awayên hêsan ji tiştên li ber destan sûdê bigirin û teşeyên hunerî yên xweşik çêkin.

Amûrên pêwîst: tayê geş, pênûsa risas, kerton, darikê diranan, şîrêz,firçe û hin xemilên din.

Ji bo çêkirina selikikê divê em van gavan bişopînin:

1-Tiştên ku em dixwazin, em ê li ser kertonê nîgar bikin û darikên diranan di kertonê de biçikînin û bi şîrêzê wê xurt bikin.

2- Bi şêweyekî hûnandî em ê ta li darikan bigerînin.

3- Ji bo xemlandina selikê em dikarin libê lûlû û terîşên bişewq li derdora wê bigerînin, ta ku em selikek xweşik bi dest bixin.

RAHÊNAN

Hewl bide ku tu teşeyekî hunerî ji darikên diranan û tayên geş çêkî û pelandinek hunerî lê zêde bikî, her wiha hûrbîniyê di karê xwe de li ber çavan derbas bike.

WANE 3

MÛMDANK

Armanca hunerî: Bilindkirina asta afrandinê li cem xwendekar, di çêkirina gewdeyekî ji xaran bi awayekî hunerî.

Xar: Ew ji lîstokên kêfxweşiyê didin me û ji bilî wê em dikarin gewdeyên hunerî ji wan çêkin, her wiha wekî dîzayinkirineke hunerî di malan de tê bikaranîn.

Amûrên pêwîst: xar, kilora CD, hinek gul û terîşên xweşik ji bo xemilandinê, demançeya sîlîkonê.

Gavên çêkirina mûmdankeke ji xaran:

Di destpêkê de em ê kilorek CD bînin û bi şêweyekî bazinî çar rêz xar bi silîkonê pê vekin, piştre em ê hin xemlên din lê zêde bikin û di dawiyê de em ê mûmekê di nîvê kilora CD de bi cih bikin, ji bo bidestxistina mûmdankeke hunerî û xweşik.

2

3

RAHÊNAN

Hewl bide ku tu bi awayekî hunerî, gewdeyek ji xaran û hinek xemlan çêkî, her wiha hûrbînî û paqijiya kar li ber çavan bigire.

WANE 4

TEŞEYÊN JI KILORA (CD)

Armanca hunerî: Bidestxistina xwendekar kêrhateyên jêkirin û pêvekirinê ji bo çêkirina karekî hunerî.

Di her malekê de, kilorên CD yên ku nema tên bikaranîn hene, ji dêvla ku em wan biavêjin, em dikarin teşeyên hunerî yên xweşik ji wan çêkin.

Amûrên pêwîst: kilora (CD), cawbir, sênî, şerbik, neynik û şîrêz .

Gavên çêkirina karên hunerî ji kilorên (CD):

Em ê kilorek (CD) bînin, ji bo jihevekirina qaşilê leyzerî ji kilora CD em ê kilorê demekê bixin nava avê de, piştre di rêya cawbirê re em ê parçeyen biçûk ji qaşilê leyzerî bi teşeyên cuda jêkin û em ê di rêya şîrêzê re wan perçeyên biçûk bi sênîkê vekin, di encamê de em ê teşeyên hunerî yên xweşik bi dest bixin.

RAHÊNAN

Di rêya ku tu dibînî guncaw re, hewl bide ku tu karekî hunerî di rêya bikaranîna kilorên (CD) re, pêk bînî û hûrbîniya karê hunerî di ber çavan re derbas bike.

WANE 5

KARÊN JI GÛZIKA ÇAMÊ

Armanca hunerî: Geşdana karînên xwendekar di çêkirina karên hunerî de, bi gelek xaman.

Em dikarin ji gûzika çamê sûd bigirin, ji bo çêkirina teşeyên xemilandinê yên cuda û bikaranîna wê weke dîkorekî xweşik ku aramiyê di derûniya mirov de peyda bike.

Amûrên pêwîst: parçeyek kerton, gûzika çamê û şîrêz.

Gavên xebatê:

Em ê kertonê bi awayekî bazinî jêkin û gûzika çamê bi alîkariya şîrêzê bi derdora wê vekin û bi berdewamkirina bi vî rengî, em ê teşeyeke hunerî xweşik bi dest bixin.







RAHÊNAN

Bi sûdgirtina ji gûzikên çamê hewl bide ku tu gewdeyekî ku tu dixwazî, çêke û bixemilîne. Her wiha hûrbînyê di karê xwe de, di ber çavan re derbas bike.

BEŞA SÊYEM: ÇANDA HUNERÎ

1- HUNER DI ŞARISTANYÊN MOZOPOTAMIYAYÊ DE (1)

2- HUNER DI ŞARISTANYÊN MOZOPOTAMIYAYÊ DE (2)

3- HUNERA ŞARISTANIYA MISRÊ YA KEVIN

WANE 1

HUNER DI ŞARISTANIYÊN MOZOPOTAMIYAYÊ DE (1)

Armanca hunerî: Naskirina xwendekar ji giringiya hunerê re di diyarkirin û belgekirina şaristaniyan de.

Hunerên kevn li mezopotamiyayê wek kevntirîn şêwazên hunerî di serdemên dîrokî de, tê dîtin. Ev huner di bin siya şahan de bû, her wiha gelek beşên şêwazên hunerî hene:

Huner di şaristaniya sumeran de: Ew ji şaristaniyên kevn ên di başûrê mozopotamiya de ye, dîroka wê di rêya nivîsa mîxî ya li ser tabloyên ji heriyê nîgarkirî, dihat naskirin. Ev huner bi çêkirina gewdeyên traşkirî û nexşeyên li ser kevirên binirx û girêdana wan bi xwzayê û bûyerên rojane re, navdar bû. Her wiha di çêkirina mohrên biçûk û lûleyî yên ku wêneyên cuda, wêneyên cengan û xemla avahiyan di nava xwe de hildigire, afirmend bûn.

Muhrên lûleyî

Peykerên şarstaniya sumeran

Cudahiyeke sumeran di avahîsaziyê de hebû, ku teşeyên kelpîçî ên rast bi kar anîbûn. Ev cureyê kelpîçan taybet bi mezopotamya bû û şêweyê avahiyên wê şêweyê zîgoratan bû. Mînak: zîgorata Ûr, bi perstegeha spî dihat naskirin, ji ber ku boyaxkirina pêşiya wê bi cebsînê bû.

Zîgorata Ûr

RAHÊNAN

Hewl bide ku tu wêneyên ji karên hunerî yên avahî û peykersaziyê yên şaristaniya Sumeran kom bikî û lênûseke taybet bi wê vekî, ku ji te re di şaristaniyên berê de wekî jêdereke hûnerê be.

WANE 2

HUNER DI ŞARISTANIYÊN MOZOPOTAMIYAYÊ DE (2)

Hunera di şaristaniya babilê de: Babil li başûrê Bexdê cih digire, peyva babil tê wateya dergehên xwedawendan, Babil bi dîwarên xwe yên bilind û asê û bi bedewbûna perestegeh, koşk û baxçeyê xwe yên daliqandî navdar bû. Di aliyê avahiyê de şaristaniya Sumer û Babil nêzîkî hev bûn ji ber xwezaya erdnîgariya başûr û nîvê Mezobtamyayê û ji ber peydabûna axê, ev heyber bû heybera bingehîn di çêkirina avahiyan de. Dergeha Eştar ji avahiyên bedew û balkêş di şaristaniya Babil de bû.

Dergeha Eştar

Her wiha ji avahiyên hunerî keleha Babilê jî bû. Tê texmînkirin ku ev keleh ji heft qatan pêk tê, qat her ku bi jor ve diçin rûbera wan kêm dibe û qata heftan perestgeh bû.

Wêneyek aşopî ji keleha Babilê

Huner di şaristaniya Asûrî de: Ev şaristanî li bakurê Mezobotamya ava bûbû, hunera wê bi tomarkirina dîrokên cengên wan dihat naskirin. Peykersaziya gewdeyê mirovan bala hunermendên Asûrî bi qasî peykersaziya gewdeyên lawirên efsaneyî û belîkirina hêza masûlkeyan li cem lawiran, nedikişand. Mînaka vê yekê gayê bibask yê xwediyê seriyekî mirovî ye.

Her wiha hunermendên Asûrî giringî didan nexşeyên kolandî yên rengkirî û nerengkirî. Ji bo nexşeyê xwe yên ku bi heriya axa hûr çêdikirin, boyaxeke taybet

bi kar dianîn û ew wekî kirêçê xwediya rengên balkêş bû, lê ji bo sênî û peyalan nexşeyên geometrîkî yên hêsan bi kar dianîn.

Peykerê gayê bibask

Peykerê Semîramîs

RAHÊNAN

Li ser hunerê di şaristanya Mozopotamiyayê de, di rêya jêderên ji pirtûkxaneya dibistanê yan jî ji navendeke hunerî, lêkolîn bike û wê bi wêneyên guncaw dewlemend bike.

WANE 3

HUNERA ŞARISTANIYA MISRÊ YA KEVN

Armanca hunerî:

Bilindkirina asta xwendekar ya hunerî, di rêya naskirina şaristaniya Misrê ya kevn de.

Hunera Misrê ya kevn roleke pir mezin di pêşketina şaristaniya Misrê de lîstiye.



Nivîsa hîroglîfî

Peykerê Nefertîtî

Reng di hunera Misrê ya kevn de: Tu şaristaniyan wekî Misrê reng bi kar neanîne.

Wêne û peykerên wan bi rengên geş û bişewq, navdar bûn, ku bidestxistina rengan ji van jêderan bû:

1-Rengê sor: Ji kevirê (Maftê) yê ku li biyabana rojavayî ya li Misrê, hatiye bidestxistin.

2- Rengê zer: Ji kevirê zer yê ku li biyabana rojhilat û rojavayê, hatiye bidestxistin.

3-Rengê şîn: Ew ji kanzaya (Azorît) ya ku di nîvgirava Sîna û biyabana rojhilat de ye, hatiye bidestxistin.

4-Rengê kesk: Ew ji kanzaya (Melakît) ya ku di nîvgirava Sîna û biyabana rojhilat de ye, hatiye bidestxistin.

5- Rengê spî: Ji tevlihevkirina cebsîn û bezê lawiran dihat bidestxistin.

6-Rengê reş: Ji tevlihevkirina komir û bezê lawiran dihat bidestxistin.

Hunera avahiyê di Misra kevn de:

Em dikarin hunera avahiyê wiha pênase bikin: Ku ew xebata bi zanebûn hatiye kirin.

Ji bo afrandina teşeyên TD, Misriyan gelek xam bi kar anîn û çêkirina avahiyên wan ji kevir bû. Mînak pîramîd diket xizmeta baweriyên wan yên olî.

Pîramîd

Hunera peykersaziyê: Ew hunera ku ji bo çêkirina peykerên mezin, dihat bikaranîn.

Mînak: Peykerê Ebûlhol yê ku dirêjahiya wî 73,5m ye û bilindbûna wî jî 20m ye. Her wiha ji bo çêkirina peykerên biçûk Misriyan (giranît), text û heriya sorkirî bi kar dianîn.

Peykerê Ebûlhol

Hunera wênekirinê: Ew hunera ku li gorî giringiya kesayetan nîgarkirina qebareya wan di wêneyan de ji hev cuda bû. Mînak nîgarkirina wêneyên şah û kesên nêzî wî, ne mîna nîgarkirina kesên din bû ku di wêneyan de, milê şahan ber bi pêş ve xuya dikir, lê kesên din ji aliyekî ve wêneyên wan dihate nîgarkirin.

Her wiha di nîgarkirina li ser dîwarên goran de jî pêşketî bûn; ku bi dîmenên şahî, dîlan, muzîk, nêçîrvanî, werzîş û qeyikên di çemê Nîlê de nîgar dikirin.

Yek ji wêneyên ku li ser dîwaran hatine nîgarkirin

RAHÊNAN

Bi alîkariya hevalên xwe hin agahî û wêneyan li ser hunerê di şaristaniya Misrê ya kevn de kom bike û diyarî pirtûkxaneya dibistana xwe, bike.

Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê

Heftî / Meh	Heftiya Yekem	Heftiya Duyem	Heftiya Sêyem	Heftiya Çarem
Rezber			Xêzkirina gewdeyê mirov (1)	Xêzkirina gewdeyê mirov (2)
Cotmeh	Cil û bergên gelêrî	Cil û bergên gelêrî	Teşeyên ji hevîrê sîramîkê	Teknîkên rengînkirinê
Mijdar	Hêmanên dîzayinkirina hunerî (1)	Hêmanên dîzayinkirina hunerî (2)	Selikek ji ta	Neqşeya lawirî
Berfanbar	Neqşeya lawirî	Xuyanga avahiyê	Xuyanga avahiyê	Mûmdank
Rêbendan	Lêveger	Lêveger	Bêhinvedan	Bêhinvedan
Reşemeh	Dîzayinkirina rêklamekê	Daristan	Daristan	Teşiyên ji kilora cd
Avdar	Teşiyên ji kilora cd	Hunera dîkorê	Hunera dîkorê	Karên ji gûzika çamê
Cotan	Sketch (sikêtş)	huner di şaristanya mozopotamiyayê de (1)	Huner di şaristanya mozopotamiyayê de (2)	Hunera şaristaniya misrê ya kevin
Gulan	Lêveger	Lêveger		